SEREDANA BAŞÛR Ê KURDÎSTANÊ

Selam Cizîrî

Delegasyonek bi serokatîya seroka Federasyona Komeleyên Kurdîstan li Siwêdê Sermîn Bozarslan hinek hevdîtin li Başûrê Kurdisatanê di demên cuda de pêk anî.Armanca sereke ya çuyînê ew bu ku hilbijartina rêzdar Mesut Barzanî ji bona serokatîya Kurdîstana Federal û Adnan Miftî ji bona serokê parlamanê û Kemal Kerkukî ji bona cigirtîya serokê parlamanê bête pirozkirin û peşkewtinên welêt bi çavê xwe bibînîn û li ser wî babetî informasşyonê bidin dezgehên Swêdî yên eleqedar.Li gor bawerîya me ji bona wan herdu xalan heya ciyekê em gihîştin armanca xwe.

30 ê meha şeşan hevdîtinek li gel Yekîtîya Afretên Kurdîstanê hate çêkirin.Li civînê da Seroka Yekîtîya afretan Şêrîn Amedî li gel komîteya karger beşdar bûn.Di civînê de li ser navê Federasyonê Şermin Bozarslan,Şivan Berwarî û Selam Cizîrî hebun.Di civînê de li ser ”Di civatê de rola afretê” hate qisekirin. Di eynî rojê de me hevdîtinek bi Mala Xanzatê kir.Rêxistina mala xanzatê ji wan rêxistinên li jêr hatîye nivîsandinê pêk hatîye:

Yekîtîya Afretên Demokratê Kurdîstan,Bizotneweyî neteweyî Afretên Kurdîstan,Komeleya Afretên Kurdîstan,Yekîtîya Afretên Asurî,Yekîtîya xwîşkên Islamî Kurdîstan û Yekîtîya Afretên gelê Turkmen.Wana hemu nûnerên mala Xanzatê ne.

2005.0702 da Seredana Yekîtîya Lawên Demokratên Kurdîstan hate kirin.Hevdîtin li ser daxwaza nûnerê Yekîtîya Ciwanîn Kurd li Siwêd Şivan Berwarî hate li darxistin. Di civînê de li ser peywendîyên duqolî li nawberan herdu alîyan da bête xwurtkirin hate rawestandin û

daxwaza konferansekek berfireh li Kurdîstanê hate kirin.Di hevdîtînê da serokê Yekîtîya Lawên Demokratên Kurdîstan Nacat Bapîr amadebûna Yekîtîya Lawan ji bo xwurtkirina her du dezgehan û piştgirîya xwe ji bo Konferansek wusa da dîyarkirin.Di eynî rojê da li gel Yekîtîya Qutabîyên Kurdîstanê re hevdîtinek hate li darxistin.Yekîtîya Qutabîyên Kurdîstan jî amadebûyîna xwe ji bo piştgirîya YCK li Swêdê da nişandan.Wan biryar da ku seminerekê di derheqa ciwanên kurd li Ewrûpa da ji alîyê nûnerê Yekîtîya Ciwanên Kurd li Siwêd Sivan Berwarî ve bête amadekirin. Semînerek ku beşdarê wê li dor 200 ciwan bûn hate amade kirin. Ew Semîner pir bi serkeftîbû.

2005.07.03 de Hevdîtinek li gel Sekretera Giştî yê Wezîrê Mafê Mirovan Nermîn Qeredaxî re hate çêkirin.Di hevdîtinê de, li ser rewşa parastina mafê mirovan hate rawestandin.Li gor wê her ku diçe di derheqa mafê mirovan da pêşketinên ber biçav çêdibin.Her weha me di eynî rojê da hevditînek li gel Wezîrê Mafê Mirovan Dr.Mihemet Ihsan hate pêk anîn.Piştî wan hevdîtinan, bawerîyek baş di derheqa parastina mafên mirovan da li gel heyeta me çê bû. Di wan hevdîtinan de delegasyona Fedrasyonê ji Şermin Bozarslan, Serdar Dizeyî, Şiwan Berwarî û Selam Cizîrî pêk hatîbû. Di cîvînê de liser pêşketin û astengîyên heyî dûr û dirêj hate rawestandin.

2005.07.03 Civînek li gel berpirsîyarê Pilandanan Beşê Perwerdeyê Cemal Abdullah Mihemet Emin hate li darxistin.Li ser daxwaza wî biryar hate girtin ku civînek berfirehtir li gel Wezîre Perwerde Abduleziz Tayip bête li darxwistin.Paşê hevdîtinek li gel wezîrê Perwerde hate li darxistin.Wan gotin ku pêwîstîyek mezin li dezgehên kurd li Ewrûpa heye. Ji bo perwerde û semînerek mezin ji bona Sermîn di derheqa Pedagojîyê da li gel personalên xwe dane amadekirin. Ew ji wê semînerê pir razîbûn û daxwaz kirin ku têkilîyên wezaretê li gel Federasyon û Yekîtîya Lawan xwurttir bibe û di pêşerojê da li ser hin projeyên perwerdê bête rawestandin.Wana dixwestin sistema baxçê zarokan ya li Swêd li Kurdistanê çê bikin.Daxwaz ew bû ku, kadirên wan Ewrûpa û yên Ewrûpa jî Kurdîstanê zîyaret bikin.

2005.07.04 da civînek li gel Xatûn Zîn hate amadekirin.Xatûn Zîn li ser rewşa afret û tendurîstîya wan qese kir.

20005.07.04 Hevdîtinek li gel Cîgirê Serokê Parlemana Herêma Kurdîstana Federal birêz Kemal Kerkûkî hate li darxistin.
Di hevditinê da rola Parlemana Federal, demokrasî, azadî, mafê mirovan û bi teybetî li ser pirsa Kerkûkê û çareserkirina wan pirsgirêkan hate rewestandin. Rêzdar Kerkûkî got"îro civînek me ya awarte li Parlemanê bi teybetî li ser pirsa Kerkûkê heye. Ku hûn bixwazin hûn dikarin wek mîvan beşdarê wê civînê bibin.Me jî wê daxwazê ji dil û can pejirand û em jî wek mêvan li dor sê katjimêran, beşdarê wê civînê bûn. Ew civîn ji bo me pir girîng û bi wate bû.Ji ber ku her kesê dikarî bi şêweyek wekirî û azadane bîr û rayê xwe bine li ser ziman Di cîvîna li gel Kemal Kerkûkî da,Nizar Xefûr Serokê fraksîyona Partî Demokratî Kurdîstan û hinek parlamenter û kesayetî û li ser navê Federasyonê Sermîn Bazarslan, Serdar Dizeyî, Şivan Berwarî û Selam Cizîrî başdar bûn.

Di 5ê meha heftan de hevdîtinek li gel rêberê giştî yê komeleyatî Dr.Şîlan re pêk hat.Li cîvînê de li ser problemên civakî,rehabilitasyon, mendal û salmezinan hate qisekirin.

Di 5 ê meha heftan a 2005 de li gel Wezîrê Perwerde birêz Abdulazîz Tayip re hevdîtînek pêk hat. Li hevdîtînê de li ser pirsa perwerdê û modela Swêd hate peyîvandin.Rêzdar Abduleziz got"em amadene ji bona hemû yarmetîyan ji bo guherandinên li ser perwerdeyek modern û nûjen. Çi ji destê we tê, texsîr nekin. Emê heya dawî pîştgirên we bin." Wî pêşniyar kir ku ji bo personalên wezaretê semînarek li ser pedagojîyê bête dayîn. Ew bi kêfxweşî ji alîyê Seroka Federasyonê ve hate pejirandin. Ji dervayê wê jî, wan li ser kar û barên xwe informasyonek berfireh yên îro û yên dahatî de, dan. Wezîr li gel her 2 Sekreterên xwe yên Giştî û li ser navê Federasyonê,Şermin Bozarslan, Serdar Dizeyî, Sivan Berwarî û Selam Cizîrî beşdarê civînê bûn. Ji dervayî van hevditînan gelek dezgehên medyayê jî li Seroka Federasyonê Şermin Bozarslan re hevdîtinan pêkanîn.

HEVDÎTINA LI GEL SEROKWEZÎRÊ HERÊMA KURDÎSTANÊ RÊZDAR NÊÇÎRVAN BARZANÎ RE.

Di 6 ê meha 7 an 2005ê, roja çarşemê hevdîtinek li gel rêzdar Serokwezîr yê Herêma Kurdîstanê Nêçîrvan Barzanî ra pêk hat. Hevdîtin li dor katjimerekê ajot. Ew hevdîtin pir bi wate bû. Rêzdar Serokwezîr got ”em girîngîyeke mezin didin Federasyona Komeleyên Kurdîstan li Swêdê. Hûn karên gellek baş dikin û heya hûn van karên baş bikin, emê jî piştgirê we bin. Li ser rewşa nuh û ya parastinê danûstendin hate kirin. Me mizgînîya muhra Herêma Kurdîstanê li derîyê Îbrahîm Xelîl ji rêzdar Nêçîrvan sitend. Dema ku em hatin Xabûr ew Stempel(muhir) li ser Pasaporta me jî hate xistin.Niha ew mohra bi wate li ser pasaporta me heye.Em bi coş û dilxweşî ji serokwezarêtîyê veqetan.

SEREDANA SEROKÊ GELÊ KURDÎSTAN SEROK MESÛT BARZANÎ.

Demê meriv diçe li gel Serokê Herêma Kurdîstanê Rêzdar Mesût Barzanî, bêyî daxwazîya mirovî heyecanek pir mezin li ser mirovî digre. Lê demê meriv li gel rêzdar dirûne ew heyecan bi carekê wenda dibe.Wenda dibe, ji ber ku herdem ken ji nêv çavê wî dibare. Bi wê kenê şêrîn meriv xwe pir rehet dibîne. Lê deme ku ew dipeyîve, bîna Serokê Mezin Barzanîyê Nemir jê tê. Ew bi gotinên kin û bi wate ve tê naskirin. Ew zêde ji gotinên kor hez nake. Ew bêhtirîn guh dide yê li himberê xwe. Demê ku me xwest em herin hundur li gel Serok, ji der ve em liqayê wî hatin. Ji ber ku wî xwest bête pêşîya me. Demê ku em liqayê wî hatin ew heyecana li ser hemû delegasyonê bi yek ser rabû. Di hevdîtinê de Serok Barzanî ûTaha Berwarî (Nûnerê hukumetê yê Bakurê Ewrûpa)li ser navê Federasyonê Sermîn Bozarslan, Şivan Berwarî û Selam Cizîrî beşdar bûn.

Di hevdîtinê de li ser pirs û pirsgirêkên girîng hate rawestandin. Tiştê ku ji bona me herê girîng ew bû ku, em wî bibînîn, cenabê wî pîroz bikin û li ser rewşa herî dawî informasyonê ji wî werbigrin. Me înformasyonên pêwîst, bi gotinên kurt û zelal ji rêzdar Mesûd Barzanî wergirt. Serok Barzani got ”rewşa me ji hemû demî baştir e û divê hûn welê bizanîn. Nenêrin hin medyayên xêrnexwaz. Ew mecburin daxwazên me bipejirînin”

Di 8-Tirmehê de me serdana Gorra Barzaniyê nemir û Idrisê hertimzindû li gundê Barzan kir. Ji aliyê Şêx Abdullah Barzanî ve hatin pêşewazî kirin. Silava Xwedê li ser canê şehîdên nemir bin. Ew dê di dilê me deherdem bijîn.

Em bi dilek pir xweş û wekirî ji rêzdar Serok Barzanî weqetîyan. Em hêvîya serkeftinê ji bona wî dixwazin. Hêvîya me ewe ku yekdengi û yekhelwestîya gelê Kurdîstan xurttir be.

2005.07.18

Li gel silav û rêzên me

Bi ser navê Heyeta Federasyona Komeleyên Kurdistanê
Selam Cizîrî